



**Cokkînişî û Ziyane Nijîyê Mîrîyê**  
Di Kurdiya Nûbihariyê de Mîrîyê Cokkînişî û Nîyê Ziyaneke "Deyra Sekerê"  
Eylul / 2021

**پێڕێژە و بەرێژە و بەرێژە و بەرێژە**  
Kurdish Studies / 2021

**پێڕێژە و بەرێژە و بەرێژە و بەرێژە**  
Kurdish Studies / 2021

**Wêşerîyê Bêşerîyê Mîrîyê û Cokkînişîyê Mîrîyê**  
Kurdish Studies / 2021

**Dişerîyê Bêşerîyê Mîrîyê û Cokkînişîyê Mîrîyê**  
Kurdish Studies / 2021

**Mîrîyê Agriyêyê Eşerîyê**  
Agriyê Eşerîyê Eşerîyê Mîrîyê û Cokkînişîyê Mîrîyê / 2021

**Kurdish Self-Determination, Turkish Society:**  
The Making Of The Republican Nation State  
Sertan K.

**Turkey's Kurdish Question Revisited:**  
Perspectives Of Kurdish Political Parties Towards The Kurdish Issue  
Civan Hîrîyê

**A Serdana Bêşerîyê Mîrîyê û Cokkînişîyê Mîrîyê**  
Kurdish Studies / 2021

**Turkey's Kurdish Question Revisited: A Meta-Review**  
Tahmineh Aydin



**NÛBIHAR  
AKADEMÎ**

Kovara Akademîk a Xebatên Kurdî ya Navneteweyî  
International Peer-reviewed Journal of Kurdish Studies

**Cild 4 Jimar 16 Sal 8 - 2021**

**Volume 4 Issue 16 Year 8 - 2021**



**Li Ser Navê Pak Ajansê Xwediyê Kovarê û Berpîrsê Karên Nivîsê**  
On Behalf of Pak Agency the Owner of Journal and Responsible Editor  
Pak Ajans Yayıncılık Ltd. Şti. adına Sahibi ve Yazışmaları Müdürü  
Süleyman Çevik

**Edîtorê Giştî / Editor in Chief**  
Abdurrahman Adak / Prof. Dr., Mardin Artuklu University, Turkey

**Navnîşan/Address**  
Pak Ajans Yay. Tur. ve Dış Tic. Ltd. Şti.  
Zeyrek Mah. Serdap Sk. No: 26/3 Fatih/İstanbul  
Tel & Faks: 0212 519 00 09  
www.nubiharakademi.com  
https://dergipark.org.tr/tr/pub/nubihar  
E-mail: nubiharakademi@gmail.com

Yayın Sertifika No: 51437  
Yayın Türü: Yerel Süreli Yayın.  
ISSN: 2147-883X

**Mîzanpaj & Page Design**  
Ridvan Xelîl

**Çap / Printed By**  
Hünkar Organizasyon Matbaa  
Balabanağa Mah. Doğruman İş Mrk. No: 6 Büro: 5-6  
Fatih-İstanbul Tel: 0 212 520 72 59  
Sertifika No:17815

Kovara Nûbihar Akademîyê ji aliyê van îndeksan ve tê naskirin:  
The Journal of Nûbihar Akademî is accepted by these indexes:



Nûbihar Akademî kovareke bihekem, akademîk û navneteweyî ye. Di demsalên bihar û payîzê de salê du caran tê weşandin. / Nûbihar Akademî is an international peer-reviewed academic journal. It is published biannually in spring and autumn.

## **DESTEYA EDÎTORÎYÊ / EDITORIAL BOARD**

### **Edîtorê Giştî / Editor in Chief**

Abdurrahman Adak / Prof. Dr., Mardin Artuklu University, Turkey

### **Edîtorê Rêvebirîyê / Managing Editor**

Hayrullah Acar / Assoc. Prof., Mardin Artuklu University, Turkey

### **Çîgirên Edîtor / Assist. Editor**

Ayhan Tek / Assoc. Prof., Muş Alparslan University, Turkey

Leyla Kaplan / Mardin Artuklu University, Turkey

### **Edîtorên Zanistên Zimanî / Language Sciences Editors**

Darun Abdalrahman Salih / Dr., University of Sulaimani, Kurdistan-Iraq

Nurettin Beltekin / Dr., Mardin Artuklu University, Turkey

Songül Gündoğdu Yücel / Dr., Muş Alparslan University, Turkey

Tahirhan Aydın / Prof. Dr., Mardin Artuklu University, Turkey

### **Edîtorên Zanistên Edebiyatê / Literature Sciences Editors**

Bakhtiar Sadjadi / Assoc. Prof., Kurdistan University, Iran

Farangis Ghaderi / Dr., University of Exeter, England

Hemin Omar Ahmad / Dr., Soran University, Kurdistan-Iraq

Kenan Subaşı / Dr., Mardin Artuklu University, Turkey

Osman Aslanoğlu / Assoc. Prof., Dicle University, Turkey

Zülküf Ergün / Dr., Mardin Artuklu University, Turkey

### **Edîtorên Zanistên Civakî / Social Sciences Editors**

Ahmet Gemi / Assoc. Prof., Mardin Artuklu University, Turkey

Esmail Shams / Dr., Allameh Tabatabai University, Iran

İbrahim Bor / Assoc. Prof., Indiana University, USA

Kamal Soleimani / Dr. El Colegio de México, Mexican

Shahab Vali / Dr., Mardin Artuklu University, Turkey

Şehmus Kurt / Dr., Mardin Artuklu University, Turkey

### **Edîtorê Nirxandina Pirtûkan / Book Review Editor**

M. Emin Purçak / Dr., Muş Alparslan University, Turkey

### **Edîtorên Zimanî / Language Editors**

Kurmancî / Kurmanji: Yunus Demir / Kurdology MA, Mardin Artuklu University, Turkey

Îngilîzî / English: Cihat Yılmaz / PhD student, Vytautas Magnus University, Lithuania

Soranî / Sorani & Farişî / Persian: Mezher İbrahîmî / Wanebêj / Lecturer, Kurdistan University, Iran

Zazakî / Zazaki: Bilal Zilan / Kurdology MA, Mardin Artuklu University, Turkey

Tirkî / Turkish: Ebubekir Gören, Kurdology MA, Mardin Artuklu University, Turkey

### **Desteya Şêwrê / Advisory Board**

Abbas Vali / Prof. Dr., Independent Academician

Abdulwahab Khalid Musa / Prof. Dr., Nawroz University, Kurdistan-Iraq

Hamit Bozarslan / Prof. Dr., École des Hautes Études en Sciences Sociales, France

Jalile Jalil / Prof. Dr., Instituta Kurdzaniyê, Wien, Austria

Martin Van Bruinessen / Prof. Dr., Universiteit Utrecht, Netherlands

Mesut Yeğen / Prof. Dr., Independent Academician

Philip G. Kreyenbroek / Prof. Dr., Georg-August University, Germany

Salih Akın / Prof. Dr., Rouen University, France



**Mîr-i Aşiretten Eşkıyalığa:**

**Aşiret Hanedan Üyelerinin Makbulden Madunlaşma Sürecine Bakış 1800-1855**

*Nêrînek Li Pêvajoya ku Endamên Xanedaniya Eşîran*

*Ji Rewşa Meqbûliyê Ketine Rewşa Madûniyê 1800-1855*

*From Mir-I Tribe To Banditry: An Overview Of Members Of Tribal Dynasties'*

*Transformation From "Favorite" To "Subaltern" 1800-1855*

Mehmet Rezan Ekinci .....163-188

**Kurdish Self-Determination, Turkish Anxiety:**

**The Making of The Republican Raison D'état**

*Xweçarenivîsa Kurdan Û Endîşeya Tirkan: Çêbûna Aqlê Dewletê Yê Cumhuriyetê*

Serhun Al.....189-205

**Turkey's Kurdish Question Revisited;**

**Perspectives of Kurdish Political Parties Towards the Kurdish Issue**

*Ji Nû Ve Nirxandina Pirsgirêka Kurdan Li Turkiyeyê;*

*Bergehên Partiyên Politik Yên Kurdan Li Hember Kêşeya Kurdan*

Cihat Yilmaz .....206-222

**Ji Serdema Rêvebiriya Mîr Şerefê Rojki Çend Dokûment**

*Some Documents From Mir Sharaf Rojki's Emirate*

Yusuf Baluken.....223-231

**Tuhfetu'l-Xullan Fî Zimanê Kurdan a Mela Mehmûdê Bazîdî**

*A Review Of Mela Mahmoudi Bazidi's Tuhfetu'l-Khullan Fi Zimani Kurdan*

Tahirhan Aydın .....232-240

# BÛYERA MÛSA BEGÊ MÛŞÊ Û GULÎZARÊ DI KILAMÊN DENGBÊJÎYÊ DE

THE HADITH OF MR. MUSA FROM MUŞ  
AND GULIZAR IN THE SONGS OF THE SINGERS

Nesim SÖNMEZ\*

---

**Genre/Cure:**

Research Article/ Gotara  
Lêkolînî

---

**Received/ Hatîn:**

03/02/2021

---

**Accepted/ Pejirandin:**

20/10/2021

---

**Published/ Weşandin:**

28 /12/2021

---

**Pages/ Rûpel:**

122-143

---

**ORCID:**

0000-0002-6315-6075

---

**Plagiarism/Întihal:**

This article has been reviewed by at least two referees and scanned via ithenticate plagiarism website./ Ev gotar herî kêr ji aliyê 2 hakeman ve hatiye nixandî û di malpera întihalê ithenticate re hatiye derbaskirin.

---

\* Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ, Zanîngeha Wan Yuzuncu Yilê, Enstituya Zimanên Zindî, Beşa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Van Yuzuncu Yil University, Living Languages Institute, Kurdish Language and Culture Department, Van, Turkey, nesimsonmez@gmail.com

**KURTE:**

Di van demên dawîn de, li ser ziman, edebiyat û folklorê Kurdan gelek lêkolînên hêja hatine kirin. Di encama van lêkolînan de, gelek materyalên edebiyata gelêrî ya Kurdî ji wendabûnê xilas bûne. Li herêmên ku Kurd lê dijîn gelek bûyer qewimîne. Gelek ji van bûyeran bi saya kilamên dengbêjan heta roja îro mane. Yek ji wan bûyeran, bûyera Mûsa Begê Mûşê û keça Ermenî Gulizar e. Mûsa Beg, piştî wefata bavê xwe dikeve ciyê wî. Wê demê li navçeya Kopê ya Mûşê bi navê Gulizar keçek bi eslê xwe Ermenî hebûye. Mûsa Beg xwestîye bi wê re bizewice, lê daxwaza wî hatiye redkirin, li ser vê yekê wî, Gulizar revandîye. Ev bûyer li Ewropayê deng vedide, di çapemeniya wan de bi berfirehî cih digire û li herêmê jî dibe mijara kilamên dengbêjan. Di vê gotarê de, dê bûyer li gorî çavkanîyên nivîskî û devkî bê vekolîn û çawanîya derbasbûna bûyerê di kilamên dengbêjîyê de wê bê nixandî.

**Peyvên Sereke:** edebiyata gelêrî, Mûş, Mûsa Beg, Gulizar, evînî.

**ABSTRACT:**

Recently, many valuable studies have been made on Kurdish Language, Literature and Folklore. As a result of these studies, many materials of Kurdish folk literature were saved from extinction. Numerous events took place in the regions where the Kurds lived. These events have reached today thanks to the songs of the singers. One of the events in question is the incident of Mr. Musa from Muş and Armenian Girl Gulizar. Mr. Musa replaces him with the death of his father. At that time, there was an Armenian-born girl named Gulizar in Bulanik district of Muş. Mr.

Mûsa wants to marry, but when his request is rejected, he kidnaps the girl. The event reverberates in Europe and has a wide coverage in the press. In the region, it becomes the subject of singers' songs. In this article, the event will be investigated according to written and oral sources, and how the event is mentioned in the songs of singers who are among the important elements of Kurdish Folk Literature will be examined.

**Keywords:** folk literature, Muş, Mr. Mûsa, Gulizar, love.

## ÖZET:

Son zamanlarda Kürtlerin dil, edebiyat ve folkloru üzerine birçok kıymetli çalışma yapılmaktadır. Bu çalışmalar neticesinde Kürt halk edebiyatının birçok malzemesi yok olmaktan kurtulmaktadır. Kürtlerin yaşadıkları bölgelerde çok sayıda hadise cereyan etmiştir. Yaşanan bu hadiselerin birçoğu günümüze kadar dengbejlerin kılamları sayesinde ulaşmıştır. Söz konusu olaylardan birisi de Muşlu Musa Bey ile Ermeni Kızı Gülizar'ın hadisesidir. Musa Bey, babasının vefatıyla onun yerine geçer. O dönemde Muş'un Bulanık ilçesinde Gülizar adında Ermeni asıllı bir kız vardır. Musa Bey o kıza evlenmek ister, talebi reddedilince de kızı kaçıtır. Olay, Avrupa'da yankılanır ve basında geniş bir şekilde yer alır. Bölgede ise dengbejlerin kılamlarına konu olur. Bu makalede olay, yazılı ve sözlü kaynaklara göre araştırılacak, olayın Kürt Halk Edebiyatının önemli unsurlarından olan dengbejlerin kılamlarında nasıl yer aldığı irdelenecektir.

**Anahtar Kelimeler:** halk edebiyatı, Muş, Musa Bey, Gülizar, aşk.

## 1. DESTPÊK

Di navbera nivê duyemîn ê sedşala XIXan û destpêka sedşala XXan da li ser mijara têkilîyên di navbera Kurdan û Ermenîyan da nêrînên cuda cuda hene. Li gorî Celîlê Celîl, di vê serdemê de, di navbera her du milletan gelek baş bûye, Ermenî û Kurd bi çavê destebiratîyê li hev mêze kirine, Mîrê Botan Mîr Bedirxan (1803-1863) ji Ermenîyan ra derê xwe vekirîye û hinek ciwanên wan kirine nav arteşa xwe û leşkerî bi wan daye kirin (Celîlê Celîl vd: İstanbul, 16-17). Hinek çavkanî jî dibêjin di wê serdemê de Ermenî ji Kurdan ditirsîyan lê nediwêrîn zêde dengê xwe bilind bikin (Pamukçu: 2015, 17). Di hinek çavkaniyan da derbas dibe ku piştî hilweşandina Mîrektîya Botan navbera Kurdan û Ermenîyan gelek xirab bûye<sup>1</sup>. Li gor hinek lêkolînerên din jî berîya ku destê Ewropîyan neketibû nav mesele, navbera her du milletan gelek xweş bû û piştî sîyaseta rojavahîyan helwest hatîye guherandin û her dem di navbera her du milletan da gelek pîrsgirêk derketine (Kardaş: 2018, 47). Ji ber ku mijara me ne dîrok e em zêde li ser alîyê bûyerê ye dîrokî ranawestin.

Zimanê muzîkê zimanekî gerdûnî ye. Dema muzîk tê guhdarîkirin ne hewce ye meriv ji zimanê wê fêm bike, lewra ew, hestê merivan tîne zîman. Ji ber ku dengbêjî jî beşek ji muzîkê ye dengbêj bi gotin û awazên xwe vê hunerê îcra dike. Dengbêj, ew kes e ku ruh dide deng û wê zindî dike (Sönmez, 2019; 503) û ew; işqa evîndaran, bûyerên dîrokî û çanda gelan bi kilamên xwe û bi awazên xwe dixemilîne.

1 - Ji bo agahîyên berfireh bnr: Pamukçu, G. (2015) ""Ermeni Sorunu" nun Kökenleri ve XIX. Yüzyilin İkinci Yarısında Kürt - Ermeni Siyasal Ve Toplumsal İlişkileri" Ermenistan: Tarih, Hukuk, Dış Politika ve Toplum, (ed. Soyalp Tamçelik), Ankara, Gazi Kitabevi. rr.105-159



Ji ber ku zimanê Kurdî bi awayekî fermî nebûye zimanê perwerdehiyê, gelek bûyerên ku di nava Kurdistan da qewimîne bi rêya dengbêjiyê gihiştine roja me. Meriv dema bixwaze li ser bûyereke vî welaî hûr bibe lazim e ku berê xwe bide dengbêjan û kilamên dengbêjiyê. Lewra ew bûyer miheqeq di nav kilamên dengbêjiyê da cihê xwe girtîye û hetanî roja me hatîye.

Bûyera Mûsa Begê Mûşê û Gulîzara Ermenî jî her wekî bûyerên din, di kilamên dengbêjiyê de cihê xwe girtîye. Di serî da Mihemed Arifê Cizrawî (1912-1986) gelek dengbêjan ev bûyer kirine mijara kilamên xwe û strandine.

Di vê gotarê de bûyera Mûsa Begê Mûşê û Gulîzarê bi berfirehî hatîye vekolandin û li ser pirsên mîna; bûyer çawa qewimîye, çi tesîr li ser herêmê kirîye, di kilamên dengbêjiyê de çawa cih girtîye û di derheqê bûyerê de çend kilam hatine gotin, hatîye sekinandin û hewl hatîye dayîn ku bersiva van pirsan were dayîn. Di bin sernava yekem de lehengên bûyerê bi berfirehî hatine nasandin, di bin sernava duwem de bûyer hatîye vegotin û di bin sernava sêyem de jî kilamên ku hatine berhevkirin hatine nirxandin û metnên wan hatine dayîn. Di vê vekolînê de him jî jêderên nivîskî û him jî jî jêderên devkî sûd hatîye wergirtin.

## 2. LEHENGÊN BÛYERÊ

Di bin vê sernavê de lehengên bûyerê hatine nasandin. Di bûyerê de du lehengên sereke hene. Ji wan yek Mûsa Begê Mûşê ye û ya din jî Gulîzara keça Ermenî ye.

### 2.1. Mûsa Begê Mûşê

Mûsa Beg di sala 1853an da li gundê Zîranê/Khivner hatîye dinyayê (Şaşmaz, 2004: 26; Kêvonîan, 2015: 11). Gundê Zîran, girêdayî nehya Xuweytê ye, Xuweyt jî girêdayî navçeya Motkan a Bidlîsê ye (Azap, 2017: 87). Navê bavê wî Mîrza Beg e (Kêvonîan, 2015: 11). Mîrza Beg jî malbateke kevnare, xwedîniyê û dewlemend e (Ünal, 1996: 53). Navbera Mîrza Beg û rêvebirên Dewleta Osmanîyan gelek xweş bûye, lewra wî qeymeqamtîya navçeya Motkan û ya Xelatê kirîye. Dewleta Osmanîyan gelek jî wî hez kirîye û bi wî bawer bûye. Lewra ew, bi armanca ku wan firarîyên li navçeya Kopê/Bulanîkê hene û milletê derûdorên Bidlîsê tehdît dikin berdest bike jî aliyê dewletê va hatîye wezîfedarkirin. Mîrza Beg, hevalê xwe digire diçe Kopê û wan firarîyan bêtesîr dike (Şaşmaz, 2004: 26). Mîrza Beg di sala 1885an da bi sedema şerê mêrkujîyê êrişê dibe ser gundê Nokê, gelek gundiyan dikuje û ew jî li meydana şer jî aliyê kesekî bi navê Xelîl Faiq Yaqûb va tê kuştin (Kêvonîan, 2015: 11).

Bi navê Mûsa, Kazim, Niho û Cezahîr çar kurên Mîrza Beg hebûne. (Kêvonîan, 2015: 12). Ji wan Mûsa Beg, li bajarê Bidlîsê di medresê de dest bi xwendinê kirîye lê jî ber ku bavê wî hatîye kuştin, wî xwendina xwe temam nekirîye û çûye li ser kursiyê bavê xwe rûniştîye û bûye serokê eşîra Xweytîyan.

Mûsa Beg jî wekî bavê xwe navbera xwe û rêvebirên Dewleta Osmanîyan xweş kirîye. Ew, jî aliyê muteserîfê bajarê Mûşê Salih Paşa ve di rêvebirîya nehyeyan de hatîye wezîfedarkirin (Şaşmaz, 2004: 26; Azap, 2017: 210; Tekdal, 2018: 204).

Di vê serdemê da navbera Ermenîyên herêma Mûşê û Kurdistan gelege xweş bûye. Lê Mûsa Beg gelek caran êriş birîye ser gundên Ermenîyan, ew şelandine, mal û milkên wan bi destê zorê jî wan girtîye (Kêvonîan, 2015: 12). Ji ber van sedeman û hin sedemên din Ermenîyên herêma Bidlîs û Mûşê di sala 1889an de, di bin rêveberîya keşişekî Ermenî

yê bi navê Bogos Natanyan, li hember Mûsa Beg serhildan dane destpê kirin. Mûsa Beg wê demê midurê nehîyeya Xweytê bûye û bi armanca serhildana ku li hember wî dane destpêkirin têk bibe, keşiş Bogos Natanyan derdest dike û dibe teslîmî muteserîfê bajarê Mûşê dike (Şaşmaz, 2004: 49). Keşiş tê mehkemekirin û biryara cezayê zîndanê yê hetan û hetan tê dayîn (AOSW. YEE, 18/553-205-93-35). Bi sedema vê bûyerê û hin bûyerên din Ermenîyên ku li Îngiltereyê û Rûsyayê dijîn bala rayagiştî ya wan welatên biyanî dikişînin ser van bûyerên ku li herêma Mûşê qewimîne.

Ermenî, li hember vê biryarê bertekên tund nîşan didin. Bi armanca ku bûyer mezintir nebe hukûmeta Osmanîyan ferman dide ku Mûsa Beg li Mûşê were binçavkirin. Wezîfedarên dewletê daxwaza hukûmatê bi cih tînin, lê Ermenî bi vê biryarê qet qayîl nabin. Îcar hikûmat biryar dide ku Mûsa Beg li Bidlîsê were binçavkirin. Mûsa Beg, di navbera salên 1886-1888an da du salan li Mûşê û salekê jî li Bidlîsê di hepsê da dimîne. Rayagiştî ya Ermenîyan bi vê cezayê jî qayîl nabe. Hikuûmeta Osmanîyan bi sedema neqayîlbûna rayagiştî ya navnetewî, cara sêyem dixwaze Mûsa Beg bişîne cihekî din. Lê xebera Mûsa Beg ji vê biryarê çêdibe û ew firar dike (Kardaş, 2018: 47).

Di vê navberê da bi armanca ku cezayek baş li Mûsa Beg were birîn gelek gundî gilîyê wî li rêveberên hukûmatê dikin. Ji kesên gilîdar yek jî muxtarê gundê Arkavankê yê bi navê Ohan e. Mûsa Beg, zêde hêrs dibe û dixwaze cezakî bide Ohan. Mirovên Mûsa Beg destê sibehê Ohan ji mala wî digirin û dibin teslîmî Mûsa Beg dikin. Mûsa Beg, wî dike û paşê jî agir berdide bedena wî, her du destên wî ne tê da tevahîya bedena wî dişewite dibe xwelî û her du destên wî yê neşewitandî dibin teslîmî jina wî dikin. Ev her du destên wî yê ne şewitî di mehkemeya ku li Stenbolê tê kirin de weke delîl li hemberî Mûsa Beg tînin nîşandan (Kêvonîan, 2015: 13-14).

Dema rayagiştî ya Îngilîzan vê bûyerê dibihîze gelek bertekên tûj nîşanî hukûmeta Osmanîyan dide. Ermenîyên li Stenbolê dijîn ew jî bertekan nîşan didin, dest bi çalakîyan dikin û daxwaznameyek di derheqê nerazîbûna xwe de didin padişahê Osmanîyan.

Xebera Mûsa Begê ji van bûyeran çêdibe, bi rêvebirên hukûmetê ra têkilîyan datîne û dixwaze biçe Stenbolê û di mehkemeyê da xwe biparêze. Mûsa Beg, di 20ê Hezîrana 1889an da bi rêya bajarê Trabzonê diçe û di 24ê Hezîranê de digihe Stenbolê. Xwe di mehkemeyê de diparêze û sûcên ku xistine stûyê wî, bi tevahî red dike. Mehkeme bi gotinên Mûsa Beg îqna dibe, cezayê zîndanê nadiyê (Tekdal, 2018: 204) û wî sirgûnî bajarê Medîneyê dike (Kardaş, 2018: 48-49).

Piştî îlankirina Meşrutîyeta 2yan (1908) efûya giştî ji aliyê rêvebirên dewleta Osmanî ve tê îlankirin, Mûsa Beg jî ji sirgûnê vedigere bajarê xwe Bidlîsê. Di sala 1915an da Êris êrîşî dewleta Osmanîyan dike. Bi armanca parastina bajarê Mûşê û Bidlîsê Mûsa Beg bi mezinên herêmê rê yên mîna Zîyaudîn Efendî, Şêx Mehmûd, Şêx Ehmedê Xeznewî, Şêx Elaüdîne Oxînî û hin kesên din li hember dujminîyê disekine û şer dike (Ayten, 1996: 114; Epözdemir, 2007: 197).

Mustafa Kemal Atatürk, di pêvajoya Şerê Tirkan ê Rizgariyê de (Türk Kurtuluş Savaşı) dixwaze Mûsa Beg û hin pêşengên herêmê yên weke Cemîlê Çeto, Zîyaudîn Efendî, Şêx Mehmûdê Norşînî vedixwîne ji bo beşdarbûna Kongreyên Erzirom û Sêwasê (Kansu, 1986: 138). Her çiqas Mûsa Beg tevî van kongreyan nebûye jî, wekî endam hatîye hilbijartin (Baykal, 1986: 56).

Mûsa Beg di meha gulana sala 1923an da beşdarî civîneke Rêxistina Azadîyê dibe û bi sedema beşdarbûna wî ya vê civînê di 20ê kanûna 1924an da ji alîyê hêzên dewletê va tê girtin û ji bo ku were mehkemekirin hêzên dewletê wî dibin Bidlîsê (Dirik, 2008:169). Mûsa Beg bi xayîntî û îxanetkîrinê tê sucdarkirin, lê piştî hin lêpirsînan derdikeve meydanê ku ew, ne xayîn e bileks alîgirê dewletê ye. Li ser vê yekê tê berdan (ASKO, Hejmara Arşîvê: A-IV-5, D. No: 53, F: 30). Lêbelê piştî serhildana Şêx Seîd tê îdîakirin ku Mûsa Beg bûye alîkarê wê serhildanê (Alakom, 2011: 57) lewra hukûmata Enqerê wî tevî gelek malbatên Kurdan sirgûnî herêmên cur bi cur ên Anadoluyê dike. Mûsa Beg jî sirgûnî bajarê Aydınê tê kirin. (Şimşir, 1991: 24; Tekdal, 2018: 204; Kızılkaya, 2020).

Mûsa Beg û serokê eşîra Heyderan Husên Paşayê Kor, ji bajarê Aydınê firar dikin, diçin Suriyê, xwe didin kêleka Şêx Mehmûd û li wê derê dibin endamê Tevgera Xoybûnê (Îhsan Nuri Paşa, 1992: 57-58; Konê Reş, 2011; Kızılkaya, 2020). Şêx Mehmûd, ji bo alîkarîya serhildana Agirîyê (1926-1930) Mûsa Beg û Husên Paşayê Kor dişîne Agirîyê. Li gor hinek agahîyan Mûsa Beg, di rê de nexweş dikeve û di sala 1928an da dimire (Firat, 2013:235-236; Îhsan Nuri Paşa, 1992: 59; Epözdemir, 2007: 198).

## 2.2. Keça Ermenî Gulîzar

Gulîzar an jî bi şêweya Kurdî Gulo di sala 1875an de, yan jî di 1876an da li gundê Kharsa/ Güneylikê ku girêdayî navçeya Kopê ya bajarê Mûşê ye tê dinyayê (Kêvonîan, 2015: 15; Dildar, 2018; Göl, 2019: 240). Li ser kêla mezêlê wê, sala ji dayîkbûna wê dîroka 1870an hatîye dayîn. Kêvonîan di pirtûka xwe de dibêje ev dîrok bi xeletî li ser kêla mezêlê wê hatîye nivîsandin (Kêvonîan, 2015: 142). Navê bavê wê Axacan e, Axacan rêveberê mala xwe û didankêşê gund e. Bavê wê du caran zewicî ye, jina wî ya ewil dema Gulîzarê tîne dinyayê di ber zarobûnê re dimire (Alakom, 2019). Bavê wê cara duduyan ji Bidlîsê bi xanimeke bi navê Nartun a Ermenî re dizewice û ev xanim Gulîzara êfîm mezin dike (Kêvonîan, 2015: 15).

Bi navê Mîro apekî Gulîzarê hebûye û ew mezinê gundê xwe bûye, mala wî maleke mezin û dewlemend bûye. Xanimên malbata mala Mîro bi tevahî bedew bûne lê bedewbûna Gulîzarê bi nav û deng bûye.

Rojekê li gundê Gulîzarê dawetek çêdibe, Mûsa Beg di wê dawetê da Gulîzarê dibine, wê diçibîne û dixwaze pê ra bizewice, lê malbata Gulîzarê vê fikrê baş nabîne û xwesteka wî qebûl nake. Li ser vê yekê Mûsa Beg gelek diêşe, radibe mirovên xwe dişîne gund, Gulîzarê dide revandinê û wê tînin li cem wî (Kêvonîan, 2015: 21). Li ser vê kiryarê gilîyê Mûsa Beg tê kirin û piştî darizandinê mehkeme biryar dide ku Gulîzarê teslîmî malbata wê bike (Kêvonîan, 2015: 77).

Gulîzar, di sala 1892an da bi mebûsê Muşê Kexam Der Garabedian re dizewice. Ev zilameke Ermenî ye û jî gundekî nêzikî gundê wan e (Kêvonîan, 2015: 77; Kızılkaya, 2020). Gulîzar û mêrê wê li Mûşê, Dîyarbekirê û Stenbolê jîyana xwe berdewam dikin. Mêrê Gulîzarê Kexam di sala 1918an da dimire. Gulîzar di sala 1934 yan jî 1935an de diçe Parîsê cem keça xwe. Keça wê Armênouhîe Kêvonîan bi armanca xwendinê çûbûye Parîsê. Gulîzar li wê derê, ew bûyerên ku li Tirkîyeyê hatine serê wê ji keça xwe ra vedibêje (Alakom, 2019). Gulîzar, vediger Stenbolê, di sala 1947an da li Stenbolê dimire û li taxa Şîşîyê di goristana Ermenîyan da tê veşartin (Kêvonîan, 2015: 151).

### 3. REVANDINA GULÎZARÊ

Mûsa Beg, beşdarî daweta keça apê Gulîzarê dibe, di dawetê da Gulîzarê dibîne, gelek kêfa wî jê ra tê û dixwaze bi wê ra bizewice. Gulîzar, keçeke çardeh salî, bedew, narîn, porbadok, porzer, dêm mezin û çavxezal bûye. Mûsa Beg, Gulîzarê ji Mîro bi niyeteke xalis dixwaze û dibêje qelendê wê jî ez ê bi qasî giraniya wê zêran û hespeke delal bidim, lê Mîro Axa biraziya xwe nade Mûsa Beg (Kêvonîan, 2015: 17). Merivên Mûsa Beg, li ser daxwaza wî êrişê dibin ser gundê bavê Gulîzarê û wê direvînin û dibin teslîmî Mûsa Beg dikin (Kêvonîan, 2015: 27-28; François Georgeon, 2018: 375; Göl, 2019: 240).

Mûsa Beg, çar caran zewicîbûye û her çar jinên wî jî li heyatê bûne. Lê ji ber ku ew kesek nefis lawaz û çav li der bûye xwestîye Gulîzarê li xwe mehr bike. Apê Mûsa Beg, Mehmet Beg bi tundî li hember vê biryara biraziye xwe derdikeve, pêşniyaz dike ku ew dev ji vê armanca xwe ya neqenc berde û Gulîzarê bide birayê xwe Cezayîrî. Mûsa Beg ji ber nîşandana bertekên milletê herêmê û endamên malbata xwe pêşniyaza apê xwe qebûl dike û Gulîzarê li birayê xwe Cezayîrî dide mehr kirin (Uras, 1987: 460-461; Kêvonîan, 2015: 36-37).

Malbata Mûsa Beg, navê Gulîzarê diguherîne dike Fatma, wê bi zêr û zîvan dixemilîne û di nava gel da jî belav dikin ku Gulîzar ne bi destê zorê bileks bi dilê xwe hatiye (Kêvonîan, 2015: 38). Rojên Gulîzarê gelek di nav zor û zehmetîyan da derbas dibin. Ew, firsêdek dibîne û rêveberên hukûmetê agahdar dike ku Mûsa Beg, ew bi darê zorê revandîye û birîye mala xwe. Li ser daxwaza mehkemeyê ew diçe îfadeya xwe dide û di encamê da mehkeme, wê teslîmî malbata wê dike (Kêvonîan, 2015: 76-77). Gulîzar vedigere gundê xwe, paşê ew û ap û damariya xwe diçin Stenbolê (Kêvonîan, 2015: 82-83).

Derheqê Mûsa Beg de li Stenbolê doz tê vekirin (François Georgeon, 2018: 375) û Mûsa Beg jî dixwaze li Stenbolê were mehkemekirin. Lewra ew, xwe sûcdar nabîne û dixwaze vê yekê bi rîya mehkemeyê jî bide îspat kirin. Li Stenbolê mehkeme destpê dike û Gulîzar jî beşdarî mehkemeyê dibe. Bi taybetî dewleta Îngîlîzan eleqeyeke mezin nîşanî mehkemeyê dide (Çırık, 2015: 48). Mehkeme, Mûsa Beg bêsûc dibîne (Kêvonîan, 2015: 121), lê bi armanca ku bertekên Ewropîyan bêtêsîr bihêle wî sirgûnî bajarê Medîneyê dike (Epözdemir, 2007: 197; Kızılkaya, 2018; Göl, 2019: 240).

Biryara mehkemeyê li Ewropayê deng vedide û Ewropa bertekên tund nîşanî hukûmeta Stenbolê dide (Epözdemir, 2007: 197). Sedema dengvedaneke evqas mezin li Ewropayê ew bu kû, partiyên Ermenîyan yên wek Taşnak û Hançakê li bûyerê xwedî derketibûn û dixwestin misilmanan bi taybetî jî Kurdan gunehbar bikin. Wan, bi vî rengî dixwestin dewletên wek Brîtanya, fransa û Rûsya agahdar bikin ku zor û zexta Tirkên û Kurdan li ser Ermenîyan gelek zêde ye.

### 4. BÛYERA MÛSA BEGÊ MÛŞÊ Û KEÇA ERMENÎ GULÎZARÊ DI KILAMÊN DENGÊJÎYÊ DE

Evîna Mûsa Beg û Gulîzarê evîneke yekalî ye. Lewra Mûsa Beg ji Gulîzarê hezdike lê Gulîzar ji Mûsa Beg heznake. Evînek bi vî rengî çêjêke xweşik nedaye her du alîyan jî, bi taybetî ji bo Gulîzarê bûye zindan.

Ev bûyer ji rengê evîndariyê derketîye, bûye bûyereke dilsoj û di kilamên dengbêjiyê de cihê xwe girtîye. Dengbêjan ev bûyer di kilamên xwe da hûnandine û hetanî îro anîne. Li jêr, kilamên ku li ser bûyera dilsoj a Mûsa Beg û Gulîzarê hatine nivîsandin û dengbê-

jan di kilamên xwe de ew gotine, hatine dayîn. Li ser vê bûyerê bi dehan kilam ji alîyê dengbêjan va hatine gotin. Di van kilaman da tiştê herî balkêş ew e ku dengbêjan di kilamên xwe de her dem li hember kiryarên Mûsa Beg sekinîne, xwe li alîyê Gulîzarê girtine û li pêşberî Mûsa Beg bertekên tund nîşan dane.

Di tomarkirina kilamên li ser bûyerê hatine gotin de ev rêbaz hatîye bi kar anîn: Berhem û belgeyên di derheqê bûyerê da hene hatine berhevkirin, dengbêjên ku kilamên bûyerê gotine hatine tespît kirin, deng û gotinên wan bi rêya kasetên dangan û li ser malpera YouTubê hatine bidestxistin. Paşê jî gotinên wan kilaman hatîye nivîsandin û nixandin. Di nixandina kilaman da hat dîtin ku ew kilamên li ser bûyerê hatine gotin hinekên wan geleke nêzîkî hev in û kilam bi awayekî anonîm di nav millet da hatine belavkirin ango nayê zanîn ka kê ew kilam çêkirine.

#### 4.1. Nîrxandina Kilaman

Di derheqê mijarê de me deh kilam berhevkirin. Kilam bê kafîye û bê kêşa erûzê yanê bi şeklê azad hatine nivîsandin. Zimanê kilaman gelek zelal û herikbar e û peyvên biyanî têde hema bêje qet nehatine bi kar anîn.

Kilama yekem a bi navê “*Gulê û Hecî Mûsa Beg*” e ku ev kilam ji alîyê Mehmet Emîn Bozarslan va hatîye tesbît kirin. Di kilamê da Gulîzar, ku ew yek ji lehengên bûyerê ye di derheqê Mûsa Beg da fikr û ramanên xwe bi zelalî tîne ziman. Ji vê kilamê bi awayekî eşkera tê fêmkirin ku Gulîzar, naxwaze bibe hevsera Mûsa Beg û jê rica û dexalet dike ku ew, dev jê berde û wê teslîmî malbata wê bike.

*“Gulê digo: Hecî Mûsa Bego qurban*

*Ez gune me, ez gune me*

*Ez xaçik im, ez File me*

*Ez pûlik im, bêfeyde me*

*Ez ne layîqê Hecî Mûsa begê xwe me” (Kêvonîan, 2015: 137).*

Gulîzar, sedama nerazîbûna xwe jî dîyar dike û dibêje ez xaçperest im lê tu misilman î û neminkûn e ku keçeke xaçperest bibe hevsera kesekî misilman. Di her du rêzikên dawîyê de wisa tê xuyakirin ku Gulîzar, Mûsa Beg tehdîd dike û dibêje ger tu daxwaza min bi cih neyînî ez ê rayagiştî ya dinyayê rakim ser pîyan, bi ser te de bişînim û dinyayê ji te re bikim zîndan.

*“Ez ê rabim dawa xwe li nava xwe bilefînim*

*Rêka Stenbola şewitî bigirim, bikudînim*

*Ez ê textê Sultan Reşad bigirim, bihejînim*

*Ez ê heft dewletê ecnebî bi xwe û Hecî Mûsa Beg bihesînim” (Kêvonîan, 2015: 137).*

Kilama duduyan a bi navê “*Gulê û Mûsa Begê Xwêtî*” ye. Weke di vê kilamê de jî bi awayekî zelal tê xuyakirin Gulîzar, her dem xaçperestîya xwe derdixe pêşberî Mûsa Beg û dibêje li gor bawerîya min ne mimkûn e keçeke xaçperest bibe hevsera zilamekî misilman.

Kilama sisêyan jî ya bi navê “*Lo Lo Mûsa Bego*” ye. Gulîzar di vê kilamê da bi awayekî

teqez amaje dike û dibêje ku ne mimkûn e ez bibim hevsera te. Ew bi armanca ku Mûsa Beg ji gotinên wê bawer bike hinek îngeyan jî bi kar tîne. Bo nimûne di nava gel de dema kesek nexwaze karekî bike û bibiryariya xwe teqez bîne ziman dibêje “ger tu didanên min bi kelpetanan bikişînî jî ez vî karê hanê nakim” an jî dibêje “tu bi çakûçan têkeví ser singê min jî ez vî karî nakim” wisa jî Gulîzar di kilamê de Gazî Mûsa Beg dike û dibêje:

*“Gulê gotî Mûsa Bego, tu bikevî li ser singê min ewdalê*

*Bi çakûç û lo bi sindîyan*

*Tu diranê min ewdalê bikêşî lo, bi kelbetana*

*Sed we'denî li canê Gulê bikevî*

*Ez ê dîsa neyem li ser dîne hewe lo, we misilmana”* (Barlık, 2019: 34-35).

Gulîzar peyva “çakûç, sindî û kelpetanê” bi kar tîne. Wek tê zanîn ev her sê amûr jî gelek çaran ji bo îşkencekirinê têne bi kar anîn. Ew dixwaze bibêje, çawa tirpankêş dema bixwaze tirpana xwe tûj bike wê dide ser hesinê bi navê “sindî” û wê bi kakûç dikute, tu jî bi wî rengî îşkencê bi li min bikî yan jî didanê min bi kelpetanan bikişînî û îşkence li min bikî ez dîsa jî nayem ser dîne te û nabim hevsera te.

Kilama çaran jî bi navê “*Kafir Gulo*” ye, bi zarê Mûsa Beg hatîye gotin û Mûsa Beg di kilamê de pesnê xwe û malbata xwe dide. Ji kilamê tê fêhmîkirin ku Mûsa Beg gelek zêde ji Gulîzarê hezkirîye û evîna xwe ya ji bo wê, bêsînor daye nişandan. Mûsa Beg di kilamê da hunerên edebî jî bi kar anîye. Bo nimûne ji hêla xweşbûnê va ramûsanên Gulîzarê şibandîye mastê mîyan, qeymaxê gamêşan, goştê berxan û bi vî awayî hunera teşbîhê bi kar anîye. Çawa di kilama sisêyan da Mûsa Beg xwestibû ku Gulîzar vegere ser dîne Muhemmed û Gulîzarê jî ev daxwaz teqez red kiribû wisa tê xwuyakirin ku îcar di vê kilamê da jî Gulîzar ji Mûsa Beg dixwaze ku, ew dest ji dîne Muhemmed berde û bibe xaçperest. Lê Mûsa Beg jî bi heman rengî daxwaza Gulîzarê red dike û wiha dibêje:

*“Keçê bêbabê, wey zalimê,*

*Ez ê çawa terka dîne Mihemed bikim*

*Lê lê lê...bikevim dêrêêê...”* (Epözdemir, 2007: 199-200).

Kilama pêncan jî ya bi navê “*Guloya Ermenî*” ye û wek dîyalogeke di navbera Mûsa Beg û Gulîzarê da derbas dibe û sehneya ku Mûsa Beg derdikeve pêşberî Gulîzarê û ya dilê xwe jê re dibêje tîne ber çavê merivan. Di kilamê de Musa Beg ji alavên şer û pevçûnê “şûr” bi kar tîne û dixwaze Gulîzar ji tirsan be jî daxwaza vî qebûl bike.

*“Gulo rê girt çû bêriya yekdana*

*Mûsa Begê ket pêşiyê û şûr kişand ji kalana”* (Konê Reş, 2011).

Gulîzar di bersiva xwe de dibêje, rast e tu dikarî min bikuji û perçe perçe bikî lê ne mimkûn e ez daxwazên te qebûl bikim û werim cem te.

*Gulo go, ez Gulo me Guloka bavfile me*

*Tu min hûrkî, nayem ser dîne te me* (Konê Reş, 2011).

Kilama şeşan bi navê “*Gulê*” ye û Gulîzar di vê kilamê da Sultanê Osmanîyan Sultan Abdulhemîdê duduyan, tehdît dike û dibêje tu pirsgirêka min çareser dikî bike, ger tu

çareser nekî ez ê textê te bihejînim, hawarîya xwe bidim dewletan û ji wan alîkarîyê bixwazim.

*Textê Sultan Abdulhemîd bigrim û bihejînim*

*Eger îşê min pirsî ji xwe pirsî*

*Eger nepirsî ez ê telgrafê bidim duzdeh dewletên ecnebiya* (Kızılkaya: 2020).

Kilama heftan bi navê “Gulo” ye û Gulîzar di vê kilamê de bi awayekî zelal biryara xwe ya neyînî dibêje. Li gor Gulîzarê ne rast e ku kesek xaçperest bi keseke misilman ra bizewice.

*Tu Kurmanc î, ez File me*

*Ez aşiqê dînê xwe me*

*Tu serê min kurkî bi gûzana*

*Goştê min bidî ber kelpetana*

*Ez serê xwe nadeynim ser balgîha mêrê misilmana* (Miroğlu, 2013).

Ji bo ku biryara wê ya neyînî teqez tê fêhm kirin ku ew, amûrên weke “kelpetan” û “gûzan” bi kar tîne. Lewra ev amûr, amûrên îşkencekirinê ne. Gulîzar, Mûsa Beg dişibîne celadê ku bi merivan îşkence dikin û amaje bi amûrên îşkeceyê dike û dibêje ez ji te û ji amûrên te yên îşkencekirinê natirsim û li ser biryara xwe me.

Kilama heştan jî bi navê “Gulo” ye û ev kilam ji aliyê dengbêja jin a bi navê Gazîn (1959-1918) ve ya ku bi eslê xwe ji Tetwana navçeya Bidlîsê ye hatîye gotin. Di kilamê da dengbêj Gazîn xanim bi zarê Gulîzarê sedema bersivdayîna wê ya neyînî tîne ziman.

Kilama nehan jî ya bi navê “Zêmara Dayikê ji Bo Keça Xwe ya Revandî” ye. Kilam, ji aliyê keseke Ermenî ya bi navê Mîhran Damatyan û bi Ermînikî hatiye nivîsandin. Ji ber ku me tu îmkân nedît ku em xwe bigîhînin eslê wê, me wergera wê ya bi Tirkî wergerand Kurdî û di xebeta xwe de cî dayê. Kilam, ya Mîhran Damatyan e, ew bi eslê xwe ji Stenbolê ye, li Ewropayê perwerdeya xwe qedandîye, paşê vegeyîyaye Mûşê û li wir di navbera 1884-1888an de mamostetî kirîye. Di sala 1889an da dema ew, vegeyîyaye Stenbolê, wê ev bûyer, di kilameke xwe de ji devê dayîka Gulîzarê hûnandîye.

Di kilamê da bi gelemperî gelê Kurd hatîye sûcdarkirin û li Mûsa Beg heqaretên mezin hatine kirin. Nivîskar di vê kilamê de li bûyerê bi awayekî objektîf mêze nekirîye û li gor hestên xwe bûyer vegotîye. Di kilamê da ji gelek tiştên balkêş yek jî ew e ku nivîskar nave Mûsa Beg bi kar nayîne û ew weke “Cazo” bi nav kiriye. Pêwîst e ev tişt jî were gotin, ji ber ku derfet çênebûn ku em xwe bigîhînin orjînalê kilamê û me wergera wê ya Tirkî stand û nixand, dibe ku di wergera kilamê da hinek şaşî jî hebin.

Kilama dehan jî bi navê “Kilama Gulîzarê” ye. Ev Kilam jî bi awayê anonîm di nava gel de ji aliyê dengbêjan va tê strandin. Kilam ji aliyê destê sêyem va hatîye gotin û di naveroka wê de bûyer hatîye vegotin. Di kilamê de buyer bi çavê objektîf nehatîye vegotin û wisa tê xuyakirin ku nivîskar xwestîye propogandaya xaçperestîyê bike. Ji ber ku me tu îmkân nedît ku em xwe bigîhînin eslê wê, me wergera wê ya Tirkî wergerandîye Kurdî û daye.

## 4.2. Metna Kilaman

Ji ber ku li jorê kilamên ku hatine bidest xistin bi tevahî hatine nixrandin, di bin vê sernavê de tenê metnên kilaman hatine dayîn.

#### **4.2.1. Gulê û Hecî Mûsa Beg**

Gulê digo: Hecî Mûsa Bego qurban

Ez gune me, ez gune me

Ez xaçik im, ez File me

Ez pûlik im, bêfayde me

Ez ne layîqê Hecî Mûsa begê xwe me

Gulê digo: Hecî Mûsa Bego qurban

Tu min serjê kî bi dûzan

Tu goştê min rakî bi kelbetanan

Ez tu car nayê ser dîne Musulmanan

Gulê digo: Hecî Mûsa Bego qurban

Ez Gulê me Gula dîn im

Ez ê rabim dawa xwe li nava xwe bilefînim

Rêka Stenbola şewitî bigirim, bikudînim

Ez ê textê Sultan Reşad bigirim, bihejînim

Ez ê heft dewletên ecnebî bi xwe û Hecî Mûsa Begê bihesînim (Kêvonîan, 2015: 137)

#### **4.2.2. Gulê û Mûsa Begê Xwêtî**

Des mi nede, des mi nede, des mi nede

Mûsa Begê Hesenî wez Gulê me

Gulê gotî: Mûsa Begê Xwêtî, ez Gulê me

Ez axçika Kemarsitê, ez ê xaç-fille me

Ez ê rojê sê cara tewbedarê xaçê li ser singê paşa yê babê xwe me

(Kêvonîan, 2015: 138).

#### **4.2.3. Lo lo Mûsa Bego**

Bextê we sirmana, hideka lo ne ewle me

Ez ê ne layîq û babetê Hacî Mûsa Begê xwe me

Tê ji bêrîyê, tê ji bêrîyê, her du dana



Gulê gotî Mûsa Bego, tu bikewî li ser singê mi ewdalê  
Bi çakuç û lo bi sindîyan  
Tu diranê mi ewdalê bikêşî lo, bi kelbetana  
Sed we'denî li canê Gulê bikewî  
Ez ê dîsa neyêmi li ser dînê hewe lo, we misilmana  
Têj bêriyê, têj bêriyê lê, Gulik a dînim  
Ez ê rabim daw-delîngê xwe lo, li vir hilînim  
Ez ê kîsê zêrê Osmanîya lo, bi xwe ra hilînim  
Ez ê ji boyna Mûsa Begê Xwêtî, textê paşa lo, bihejînim  
Hegî paşa derdê min û Mûsa Begê derman nekir,  
Ez ê hevt duvalê Ecnebîya lo pê bihesînim (Barlık, 2019: 34-35)

#### 4.2.4. Kafir Gulo

Eman Gulê, eman Gulê, eman Gulê  
Eman Gulê...lê...kêm aqîlêê...  
Eman Gulê, bûka mala babê min ê lê  
Rabe rûneee, lê li ber pencerê...  
Ramûsanê Gula Ermen xweştir in  
Ji mastê mîyan, qeymaxê gamêşan, goştê berxan Gulooo...  
Lê rojaaa... xêrêêê...  
Ez Hêcî Mûsa Begê Xwêtî, reyîsê Motkan, serê heft eşîran  
Keçê bêbabê, wey zalimê,  
Ez ê çawa terka dînê Mihemed bikim  
Lê lê lê...bikevim dêrêêê... (Epözdemir, 2007: 199-200).

#### 4.2.5. Guloya Ermenî

Gulo rê girt çû bêriya yekdana  
Mûsa Begê ket pêşiyê û şûr kişand ji kalana  
Go ez ê te bînim ser dînê Misilmana  
Gulo go, ez Gulo me Guloka bavfile me  
Tu min hûrkî, neyêmi ser dînê te me  
Ez ne layiqî Mûsa Begê mîrê xwe me... (Konê Reş, 2011).

#### 4.2.6. Gulê

Gulê go, Hecî Mûsa Bego ez Gulê me, gula dîn im  
 Ez ê kinc û palê xwe li xwe bînim  
 Rêka çere Stenbolê bihelînim  
 Textê Sultan Abdulhemîd bigrim û bihejînim  
 Eger îşê min pirsî ji xwe pirsî  
 Eger nepirsî ez ê telgrafê bidim duzdeh dewletên ecnebiya  
 Ez ê gişka pêbihesînim (Kızılkaya: 2020)

#### **4.2.7. Gulo**

Vayê vayê vayê vayê  
 Berf dibare tev li bayê  
 Hecî Mûsa min ne kuje, ez gune me  
 Tu Kurmanc î, ez File me  
 Ez aşiqê dînê xwe me  
 Tu serê min kurkî bi gûzana  
 Goştê min bidî ber kelpetana  
 Ez serê xwe nadeynim ser balgîha mêrê misilmana (Miroğlu, 2013).

#### **4.2.8. Gulo**

Ez ne layîqe dîne te me  
 Ax ez Gulo me ez gune me,  
 Ez Guloka bavfile me  
 Welleh ez ne layiqê dînê te me  
 Ez layiqê xaça ser milê bavê xwe me (Dengbêj Gazin)

#### **4.2.9. Zêmara Dayikê ji bo Keça Xwe ya Revandî**

Heta duh jî mala me bi kêf û şahî bû,  
 Tu bê endîşe li tenîştê min rûniştibûyî û diaxivî  
 Lê niha tevahiya malbata me şîn girêdaye,  
 Gava ku tu cefayê dikişînî, her kes li dû te digirî;  
 Ax! Bexika min Guloya min  
 Çavên min tarî bûn! Cazo, tu girtî revandî

Di sêzdeh salîya te da, di rewşa te ya herî xweşik da

Gepên te mîna sêvên Ardamed in,  
Tu bi gavên piçûk dimeşî, mîna kevoka nazdar  
Porê te zer e: gula mala me!  
Tu niha li ku derêyî? Tu li ku yî, Gula min?  
Bila roja min bitefe! Cazo, tu girtî revandî

Porê te çirûsk çirûsk dibiriqe li ser enîya te ya spî,  
Bejna te zîv e, di bin kezîyên te da  
Bi hezaran cil û berg, şûtik, bazin, gerdenî, toqe, pêştemal  
Di hate dîtî di cihêzê wê da ji her rengî karê nîgarî  
Xelkê tu birî, Gula min a bextreş  
Dilê min şewîrand! Cazo, tu girtî revandî

Tevahîya ciwanên deşta Kharsê  
Bi eşqa te dişewite, ji te ra gustîlê dişîne  
Lê çi bikim qet yek layîqî te nîne  
Tu yê bibî bûk ji mamosteyê Vartenîs ra  
Ax! Hişê min ji serê min çû, Gulo ya min a bextreş  
Tê te birevîne Cazoyê Kurd

Rizgar bike Axacan! Rizgar bike Reîs Mîro  
Rabe keşîşê ciwan! Tu jî, kalo, niha rabe!  
Kurd bi şaşmîti êrîş dikin, talanê dixwazin,  
Malê talan dikin; bilez werin!  
Ew keça min Gulo dibin ji nişka va  
Keça min revand, ew Cazoyê xayîn.

Hûn jî guleyan berdî Kurdê ku bi neheqî êrîş dikin, zarokno!  
Lêxin li wan kûçikan, perçe bikin!  
Bigirin destên xwe çengelan, çoyan, bêran, daran û qamçiyên,  
Dasan, tîrpanan, xenceran, şûran û tivingan,  
Lez kin birano! Gulaya min diçe  
Senem bi qurbana we be bikujin vî Cazoyî

Gulebaran kirin ji her du alîyan va, lê jimara kûçikan gelek zêde bû  
Eco û Mîro serpişt ketin, Kalo di xwîna wî da xeniqî;  
Keşîş bûbû dînûhar, hawar digot  
Cîran gîhiştin; Lê bêfayde Gulom tu,  
Xilas nekirin, revand bir Cazo

Min qêrîna izdiraba te ya ku bi hemû hêza dianî bihîst,  
Şîreta min a dawîn bê guman gihîştiye te:  
Ax! berxika min, tu carî serê xwe li hember tirsê netewîne  
Tu carî ronahiya baweriya xwe înkâr neke, terk neke,  
Mirin ji hezkirina Cazo çêtir e.

Tu carî rûnê pîroz ê ku li eniya te tê dayîn paqij neke,  
Min got: wek dînan xwe bavêjim ser wan  
Dibe ku ez keça xwe ji destên Kurdan rizgar bikim,  
An jî ji qedera wê ez ê bimirim;

Ez ji nişka va sergêj bûm û ketim erdê;  
Hişê min ji serê min çû; Tu jî Gulo,  
Bi erdê va kaş kir bir, Cazoyê xayîn.

Revandin ew çî bikim! Revandin keça min!  
Oxaxê min kor kirin, mala min wêran kirin;  
Bapîrê min jî birin kirin gorê  
Li ser kêlika gorê hatîye nivîsandin: Bextreşîya Gulo  
Ji her du çavên min, Guloya min, ditina min dizîn  
Her du çavên te jî kor bin, Cazoyê heram

Ev çî derd e, Gulo, ez perîşan im,  
Ji bo bextreşîya te digîrim, êşa min pir mezin e,  
Xwezî tu ji dayik nebayî, xwezî tu mirîbayî  
Te yê ji Kurdê bêrehm ra xizmet nekiriba!

Xwezî tu qet bedew nebayî, keça min a delal Gulo!  
Kî dizane? Belkî ew kûçikê Cazo tu qet nedirevandî.

Xwedayê min ê asîmanan, mîn çawa çavên xwe ji tişteke wisa ra girt,  
Ku meriv qala eşqa ku dê û keçika wê bi hev va girê dide bixîne mijara vê bûyerê?  
Te çima bersiv neda bi birûskê, bi volkan  
Bi mebesta tunekirina Kurdan, ev nijada zalim?  
Her çend erd vebû ku Cazo daqurtîne  
Hema bila keça min Gulo daqurtan da?<sup>2</sup> (Kêvonîan, 2015: 159-161).

#### 4.2.10. Kilama Gulîzarê

Mala Mîro qonaxeke mezin e,  
Hatî xwezgînîyê Gulo,  
Ger bidin zor baş e; Hekana ez ê li benda keçika mezin a malê bim!  
Mûsa Beg, lênexe êdî!  
Ez keça Ermenîyeke belengaz im  
Ji min re çêtir e ku ez ji her du dînan ji bo dînê xwe bimirim.

Ez hem gul im, hem jî nergîs im  
Sapê rihanekê me; koka min tuneke  
Dîsan jî derketim pêşberî dadgehê  
Mûsa Beg, lênexe êdî!  
Ez keça Ermenîyeke belengaz im  
Ji min re çêtir e ku ez ji her du dînan ji bo dînê xwe bimirim.

Ne tî, ne birçî me  
Ez duakar im li ber deriyê Dêra Sor;  
Heta Stenbolê çûme,  
Li hember layê kûçikan sekinîme  
Mûsa Beg, lênexe êdî!  
Ez keça Ermenîyeke belengaz im

---

2 - Ji bo Tirkîya helbestê binêrin: Kêvonîan, 2015: 159-161

Ji min re çêtir e ku ez ji her du dînan ji bo dînê xwe bimirim.

Li ber çemê gundê Xhivnerê tirsnak,  
Li ber çemê kederê ê Xhivnerê,  
Mûsa Beg, sond xwar bi serê bavê xwe  
Herçiqas Gulo ciwan e, fêm neke jî, ez wê paşde nadim bavê wê.!  
Mûsa Beg, lênexe êdî!  
Ez keça Ermenîyeke belengaz im  
Ji min re çêtir e ku ez ji her du dînan ji bo dînê xwe bimirim.

Çiqas xweş e xaçê reş!  
Mîhran Axa, ji nesla keşîşan tê,  
Dikeve nava cil û nivînan ji ber eşqa Gulo ya keça Axacan  
Mûsa Beg, lênexe êdî!  
Ez keça Ermenîyeke belengaz im  
Ji min re çêtir e ku ez ji her du dînan ji bo dînê xwe bimirim.

Îro îmî an jî subê yekşem,  
Xwedê, derîyê Qiral dadbar dike  
Keçeke Ermenî çawa înkâr dike?  
Mûsa Beg, lênexe êdî!  
Ez keça Ermenîyeke belengaz im  
Ji min re çêtir e ku ez ji her du dînan ji bo dînê xwe bimirim<sup>3</sup>.  
(Kêvonîan, 2015: 161-163).

---

3 - Ji bo Tirkîya helbestê binêrin: Kêvonîan, 2015: 161-163.

## 5. ENCAM

Bûyera Mûsa Begê Mûşê û Gulîzara keça Ermenî ji alîyekê va bûyereke evînê ye û ji alîyê din ve jî bûyereke dilsoj e. Lewra Mûsa Beg evîndarê Gulîzarê ye, lê Gulîzar evîndarê wî nîne û ji ber kiryarên Musa Beg, Gulîzar rastî gelek zor û zehmetîyên dijwar tê. Di encama lêkolînên di çarçoveya vê gotarê da em gihêştin van encaman:

Di naveroka mijarê da du bawerî hene, yek bawerîya bi dînê Îslamê ye û ya din jî bawerîya bi bi dînê Mesihîyan e.

Lehengên çîrokê ji du milletan in, ew millet jî Kurd û Ermenî ne. Ev rastîya hanê jî dide xwuyakirin ku li herêma Mûşê û Bidlîsê van her du milletan bi hev re jîyaneke aşîyane û xweşik derbaskirine.

Ji lehengên çîrokê Mûsa Beg, her çi qas bi mêrxasî û zanîna xwe navdar be jî ewqas bi zulimkarîya xwe jî navdar e. Ev encama hanê di kilamên ku li ser bûyerî hatine strandin de bi awayekî zelal dixuye.

Bi qasî ku ji çavkanîyan û kilamên dengbêjan tê fêhmkirin evîn evîneke yekalî ye. Yanê Mûsa Beg ji keça Ermen Gulîzarê hezkişîye û xwestîye pê re bizewice lê Gulîzarê nexwestîye bi wî re bizewice û bibe bermalîya wî.

Çavkanîyên ku li ser bûyerê hatine nivîsandin û kilamên dengbêjan didin xwuyakirin ku dema Mûsa Beg, Gulîzarê bi darê zorê direvîne, jê dixwaze ew dev ji dîne xwe yanê dest ji Xrîstîyantîyê berde û bibe Misilman, lê Gulîzar li hemberî vê daxwazê bertekên tund nişan dide û vê yekê qebûl nake. Dîsa ji kilaman tê gihîştin ku, herçi qas Gulîzarê ev yek qebûl nekiribe jî Mûsa Beg navê wê guherandîye û kirîye Fatma. Wisa tê fêmkirin ku her du leheng jî naxwazin dev ji dînê xwe berdin.

Ji çavkanîyên ku em gihîştinê tê fêhmkirin ku di nîveka dawîya sedsala XIXan û destpêka sedsala XXan de navbera Kurdan û Ermenîyan ne gelek baş e.

Di çavkanîyên ku li ser bûyerê hatine nivîsandin de derbas dibe ku dewletên Ewropîyan û Împaratoriya Rûs bertekên gelek tûnd li hember kiryarên Musa Beg nişan dane.

## 6. ÇAVKANÎ

- Alakom, R. (2011). *Xoybûn Örgütü ve Ağrı Ayaklanması*. İstanbul: Avesta Yayınları.
- Alakom, R. (2019). *Gülizar'ın Feryadı; "Mûsa Bey Vurma Artık!"*. (Ragihandin: 10.09.2020). <https://nupel.net/rohat-alakom-kurt-sarkilarinda-ermeni-dostlugu-17929h.html>
- AOSW (Arşîva Osmanîyan ya Serokwezîrtîyê), Hêjmar Arşîvê: YEE, 18/553-205-93-35.
- ASKO (Arşîva Serokkomarîyê ya Osmanîyan), Hêjmar Arşîvê: A-IV-5, D. No: 53, F: 30.
- Ayte, M. A. (1996). *Bûrket-ul Kelîmât fî-Menâkîbî Bâdî es-Sadât*, Bitlis.
- Azap, E. Y. (2017). *Bitlis Salnameleri*. İstanbul: Betav Yayınları.
- Barlık, M. (2019). "Dengbêjliğin Farklı İnançlardan İnsanların Aşkını Dile Getirme Gücü: Örnek Olarak, "Ermeni Gulê Ve Mûsa Begê Xwêtî" Kîlami Ve Sunumu". Uluslararası Dengbêjlik Kültürü ve Dengbêjler Sempozyumu Bildirileri, Şırnak, Şırnak Üniversitesi Yayınları.
- Baykal, B. S. (1989) *Heyet-i Temsiliye Kararları*, Ankara: Türk Tarih Kurumu Yayınları.
- Celil, Celîlê vd. (1998) *Yeni ve Yakın Çağda Kürt Siyaset Tarihi*, İstanbul, Peri Yayınları.
- Çırık, B. (2015). *Üç Devirde Bir Kürt Aşireti Reisi Hacı Mûsa Bey (1853-1928)*. İstanbul: Değişim Yayınları.
- Dengbêj Gazin, Ez ne layiqê dînê te me. (Ragihandin: 17.09.2020). <https://www.youtube.com/watch?v=z623aju7myY>
- Dildar, R. (2018). *Gula Ermeni û Hecî Mûsa Beg*. (Ragihandin: 10.09.2020). <http://www.rupelanu.com/gula-ermeni-u-heci-musa-beg-405yy.htm>
- Dirik, K. D. (2008). *Vali Paşa Kâzım Dirik Bandırma Vapurundan Halkan Kalbine*, İstanbul: Güner Yayınları.
- Epözdemir, Ş. (2007). "Hecî Mûsa Begê Xweytî û Seidê Nuh Begî". *Bîr, Kovara Lêkolîn û Lêgerînê*, 7 (Tebax), r. 197-203.
- Firat, M. Ş. (1992). *Doğu İlleri ve Varto Tarihi*, İstanbul: B Yayınları, 2013, s.235-236
- François Georgeon. (2018). *Sultan Abdülhamid*. Ali Berktaş (Çev.). İstanbul: İletişim Yayınları.
- Göl, H. (2019). "Osmanlı Mebusan Meclisi'nde Aynı Bölgeden İki Milletin Temsili: Muş Milletvekilleri Kigam Der Garabetyan Ve Hacı İlyas Sami Bey" Tarih ve kültür Bağlamında Muş Uluslararası Sempozyumu Bildirileri. Ankara: Atatürk Araştırma Merkezi Yayınları.
- İhsan Nuri Paşa. (1992). *Ağrı Dağı İsyanı*. İstanbul: Med Yayınları.
- Kansu, M. M. (1986). *Erzurum'dan Ölümüne Kadar Atatürk'le Beraber I*, Ankara: Türk Tarih Kurumu Yayınları.
- Kardaş, A. (2018). "XX. Yüzyılın Başında Bitlis'te Bir Aşiret Reisi: Hacı Mûsa Bey". *Türk & İslam Dünyası Sosyal Araştırmalar Dergisi*, s. 5 (19), 45 - 58.
- Kêvonîan, A. (2015). *Gülizar'ın Kara Düğünü*. (Çev.) Aslı Türker- Ece Erbay. İstanbul: Aras Yayınları.
- Kızılkaya, M. (2020). *Mûsa Bey ile Gulizar!* (Ragihandin: 10.08.2020). <https://www.haberturk.com/yazarlar/muhsin-kizilkaya-2291/2689438-Mûsa-bey-ile-gulizar>
- Konê Reş. (2011). *Hecî Mûsa Begê Xwêtî 1855-1928*. (Ragihandin: 08.09.2020). <http://www.welateme.net/kurdi/modules.php?name=News&file=article&sid=2389#.X2IEPmgzaUk>
- Miroğlu, O. (2013). *Khars Köyü'nün Gülizarı*. (Ragihandin: 10.09.2020). <https://www.star.com.tr/yazar/khars-koyunun-gulizari-yazi-749273/>  
105-159. sayfalarında yayımlanmıştır:



- Pamukçu, G. (2015) ““Ermeni Sorunu”nun Kökenleri ve XIX. Yüzyılın İkinci Yarısında Kürt - Ermeni Siyasal Ve Toplumsal İlişkileri” *Ermenistan: Tarih, Hukuk, Dış Politika ve Toplum*, (ed. Soyalp Tamçelik). Ankara: Gazi Kitabevi.
- Sönmez, N. (2019). “*Di Kilamên Dengbêjîyê De Evîna Keça File û Xortê Misilman (Mînak: Meyrema File û Elîyê Qolaxasî)*”. Uluslararası Dengbêjlik Kültürü ve Dengbêjler Sempozyumu Bildirileri, Şırnak, Şırnak Üniversitesi Yayınları.
- Şaşmaz, M. (2004). *Kürt Mûsa Bey Olayı (1883-1890)*. İstanbul: Kitabevi Yayınları.
- Şimşir, B. N. (1991). *İngiliz Belgeleriyle Türkiye’de Kürt Sorunu (1924- 1938)*. Ankara: Türk Tarih Kurumu Yayınları.
- Tekdal, D. (1918). *II. Abdülhamid Döneminde Bitlis Vilayeti (İdarî Ve Sosyal Yapı)*. Teza Doxtorayê. Denizli: Zanîngeha Pamukkaleyê.
- Uras, E. (1987). *Tarihte Ermeniler ve Ermeni Meselesi*. İstanbul: Belge Yayınları.
- Ünal, F. (1996). “*Ermeni Olaylarından Bir Safha; Kürt Mûsa Bey Olayı*”. *Kafkasya Araştırmaları Dergisi*,7(2), 51- 64.

PÊVEK



Wêneya Mûsa Beg (Kêvonîan, 2015: 100).



Wêneye Gulîzarê, ev wêne di sala 1889an de weke kartpostalekê hatîye weşandin (Kêvonîan, 2015: 100)

## EXTENDED ABSTRACT

Recently, many valuable studies have been made on Kurdish Language, Literature and Folklore. As a result of these studies, many materials of Kurdish folk literature were saved from extinction. Numerous events took place in the regions where the Kurds lived. These events have reached today thanks to the songs of the singers. One of the events in question is the incident of Mr. Musa from Muş and Armenian Girl Gulizar. Mr. Mûsa replaces him with the death of his father. At that time, there was an Armenian-born girl named Gulizar in Bulanik district of Muş. Mr. Musa wants to marry, but when his request is rejected, he kidnaps the girl. The event reverberates in Europe and has a wide coverage in the press. In the region, it becomes the subject of singers' songs. In this article, the event will be investigated according to written and oral sources, and how the event is mentioned in the songs of singers who are among the important elements of Kurdish Folk Literature will be examined.

There are different opinions about the relations between Kurds and Armenians in the second half of the 19th century and the beginning of the 20th century. According to some researchers, the relations between Kurds and Armenians during this period were very good. Kurds and Armenians regarded each other as brothers. Some sources, on the other hand, express a different opinion. According to them, they were not on good terms, but Armenians did not speak up because they were afraid of the Kurds. According to some researchers, the situation worsened when Europeans got involved. Since the subject of our research is not history, we did not examine the subject in depth.

The Musa Bey incident, like other events, was the subject of folk songs sung in Kurdish. The artist who first handled the event in his folk song is Arif Cizrevi. In this research, the incident that took place between Musa Bey and his Armenian girl Gulizar was examined in depth. In the research, it has been tried to give answers to questions such as how the event took place, what effect it had on the region and how it took place in the songs of the artists.

The research was handled under three main headings. Under the first title, the heroes of the event are introduced in detail. The event is reported under the second heading. Under the third title, the collected folk songs were evaluated. In addition, the lyrics of the folk songs are given.

The protagonists of the event are Musa Bey and the Armenian girl Gulizar. Musa Bey is a respected figure in the community. He was invited to Erzurum and Sivas congresses by the Ankara government. Although Musa Bey did not attend the congresses, he was elected as a delegate. However, due to some events that occurred later, he was declared a traitor. First, he was exiled because of the incident, and then he was sentenced to death on the grounds that he was involved in some political events. Thereupon, Musa Bey found a way and escaped to Syria and died there.

The incident took place when the Armenian girl Gulizar was still at an age that could be called a child. His mother died when he was a child, and he was raised by his step-mother. He was kidnapped by Musa Bey without his consent. Gulizar found a way to inform the security forces of this incident. As a result of the court, the girl was handed over to her family. Gulizar later immigrated to Istanbul with her family. Here the court

opened. Musa Bey was summoned by the Istanbul government. Musa Bey was tried and exiled, although he was found not guilty. Gulizar Hanım got married and later went to live with her daughter in Paris, the capital of France. There she told his daughter about the events that had happened to her one by one. Her daughter also published this event as a book.

This event caused serious repercussions in foreign countries, the press covered the issue for days and politicians held various meetings.

This event has two aspects. The first of these is a love story lived one side. The second aspect is an event that hurts and is abused. Because Musa Bey is in love with Gulizar lady. Gülizar, on the other hand, is not in love with him. For this reason, Gulizar faced various difficulties. There are two different beliefs involved in the event. Musa Bey is a Muslim, and Gulizar Xanim is a Christian. That is, the love continues unilaterally.

According to the sources, when Musa Bey kidnapped Gulizar by force, he also pressured him to become a Muslim. However, despite all the pressures, Gulizar did not return from her religion. According to the folk songs, Musa Bey forcibly changed her name and named her Fatma. As a result of the researches, ten folk songs related to the event were identified. These folk songs have been evaluated in terms of form and content. In terms of content, they are generally similar to each other.

Since the originals of two of the obtained folk songs were not reached, their Turkish was translated into Kurdish.